




Aydin Batur

folklorame 

## SPAS JI BO ALÎKARÎYA WAN

Aydin Batur  
Beroj Mukrîyanî  
Bîrgun Uzûm  
Durust Îzzet  
DÎHA  
Dûrzan Cîrano  
Eşref Bolumcu  
Ferhat Arslan  
Mazlûm Sîyabend  
Mûrat Adiyaman  
Orhan Tanhan  
Şikrî Tûran  
Zeynep Yaş



### Kovara folklorê ya sê mehane

**Sal:** 3

**Hejmar:** 10

**Xwedî:** Li ser navê Weqfa Mezopotamyayê, Selîm Olçer

**Berpîrsa Nîvîsan:** Gevrîye Atli

**Edîtor:** Eşref Keydanî

**Redaksîyon:** Evîndar Şevîn

**Desteya Weşanê:**

Celîlê Celîl

Bêrîvan Matyar

Elîf Gunduz

Mem Mukrîyanî

Zîya Mukrîyanî

**ISSN:** 2667-6443

**Grafîk:** Sevînç Adiyaman

**Fotoyê bergê pêş:** Beroj Mukrîyanî

**Fotoyê bergê paş:** Aydin Batur

**Navnîsan:** Weqfa Mezopotamyayê

Mezopotamya Eğitim Bilim Sanat Sağlık ve Kültür Vakfı

İktisadi İşletmesi

Urfa Yolu Üzeri, Serhat Plaza A/Blok

Kat: 11 No: 29 Kayapınar/Diyarbakır

**Sertifika №:** 42382

**Çapxane:** Alioğlu Matbaacılık Bas. Yay. ve Kağı. San. Tic. Ltd. Şti.


Orta Mah.Fatin Rüştü Sk. No: 1-3/A Bayrampaşa-İstanbul

Tel: 0212 612 95 59

**Sertifika №:** 16919

TÊKILÎ  
folklorame@gmail.com   
folklorame

Her niviskar ji nivîsa xwe  
berpirsiyar e.



## Pirtûka pêşnîyazkîrî

Navê pirtûkê: Folklorâ Kurdî  
Nivîskar: Sadiq Bahaeeddîn Amêdî  
Weşanxane: Weşanxaneya Lîsê



## Naverok

- |      |   |
|------|---|
| 5    | Ji edîtorî  |
| 6.   | Mêro alvêr i, carna kar i carna xisar i, <b>Bêrîvan Matyar</b>                          |
| 9.   | Nokêن qelandî, <b>Ayela Zarto</b>   |
| 15.  | Kilama Hesenê Sedo, <b>Elîf Gunduz</b>  |
| 16.  | Borê Qer, <b>Ahmet Seyarı</b>   |
| 21.  | Xaçepirsa folklorê, <b>Oktay Altûn</b>  |
| 22.  | Hin îdyomên Erxenîyê-1, <b>Eşref Keydanî</b>  |
| 25.  | Aqil û siûd, <b>Kurdjan Sorî</b>  |
| 44.  | Ecîn, <b>Şehrîban Matyar</b>  |
| 47.  | Mormorî, <b>Wildan Sevîm</b>  |
| 49.  | Bawerîyên gelî, <b>Nûredîn Vûral</b>  |
| 56.  | Tiştanokêن Qelqeliyê, <b>Mehmet Yıldırımçakar</b>                                       |
| 58.  | Gora Le'lîxanê û Pira Baft, di nameya Mela Xelefê Bafeyî da,<br><b>Hêmin Omar Ahmad</b> |
| 62.  | Ahmed û Miheme, <b>Mehpûs Serhedî</b>   |
| 70.  | Danasîna Pirtûka Xoce Simayîl, Dînê Bîrewer, <b>Alan Pîrê</b>                           |
| 78.  | Çend pêkenok, <b>Mem Mukriyanî</b>  |
| 81.  | Hin gotinêñ kêmnas yên Herêma Botanê, <b>Dildar Botî</b>                                |
| 89.  | Du kilam ji eşîra bêrtîyan, <b>Helbest Çetîn</b>  |
| 91.  | Dewrêşê Evdî (Delal), <b>Evîndar Şevîn</b>  |
| 98.  | Bastîqa qelandî, <b>Xecê Bîşeng</b>   |
| 100. | Ji Kurecîka Meletîyê du şîn û çîrokêñ wan, <b>Mahîr Ugur</b>                            |
| 108. | Hinek gotinêñ pêşîyan ji Herêma Botanê, <b>Rînas Xendekî</b>                            |

## Ji edîtorî

Bendewar û hezkirîyên folklorê, va îca jî me cilika xwe ji avê derxist û me ji we ra hejmarâ xwe ya 10ê amade kir. Pîroz be li cimeata kurdan.

Wekî ku Seydayê Tîrêj jî dibêje, em dizanin “warê me welat e, rêça me dûr e.” Ji ber ku barê me barê welitekî ye, barekî giran e; û rîya me jî dûr e. Ev rîya dûr jî bê arîse jixwe nabe. Hin nexwesi û problem derketin pêşîya me di pêvajoya derxistina vê hejmarê da, loma jî em dereng man. Biborin ku me hûn ji tama folklorê bêpar hêlan. Herku me qala derengmayînê kirîye, ez dixwazim ku gotinê bînim ser problemên derketine pêşîya me. Yek jê ev e ku dema nivîsek ji me ra tê û lijne dixwîne û dinirxîne, ligel xalêñ destnîşankirî ji nûseran ra tê şandin. Ji xalêñ ku em destnîşan dîkin yek ew e ku divê berhevkar deqa xwe kontrol bikin û deqê bi awayekî baş deşifre bikin û ti guhertinan tê da nekin. Ligel ku em her car vê hişyarîyê dîkin, piştî çend caran em nivîsan kontrol dîkin û li dengan guhdarî dîkin, em dibînin ku berhevkaran baş guh nedaye zarbêjê/i. Îcar em mecbûr dimînin ku nivîsê li xwedîyan vegeŕînîn da ku ji nû ve li ser bixebeitin. Îcar ev jî dibe sebeb ku li me bibe derengî. Çimkî nivîsek çend caran diçe û tê, heta ku rêkûpêk bibe. Yek jê jî ew e, di nivîsên lêkolînî da divê lêkoler çavkanî û palpiştên xwe bi awayekî zanistî destnîşan bikin. Ku ev palpişt û çavkanî tune bin, şik û guman sîya xwe berdide ser nivîsê.

Dîsa di vê hejmarê da, bi beşen cuda yên folklorê me ji we ra tamîş amade kirin. Ji zargotin û bawerîyên gelêri, ji çanda xwarin û vexwarinê, ji muzîka gelêri me ji we ra hin nimûne berhev kirin û amade kirin. Hêviya me ew e ku bi dilê we be.

Di tûrikê me yê zargotinê da gelek keresteyên cihêreg hene, xebroşka Mehpûs Ser-hedîyî ya Qerejdaxê, xebroşka dipîdirêj ya Kurdjan Sorîyî ya bi navê Aqil û Siûd, tiştanokên Qelqeliyê, idiomên Erxeniyê, du stranên şînê û çîrokên wan yên Herêma Kûrecîkê hin ji wan cihêregîyan in. Dîsa menqibeya Borê Qer ku Ehmed Seyarîyî berhev

kirîye berhevokeka balkêş e, çimkî ev menqibe yan jî qewl hîn di sedsala

16. da ji alîyê Elî Herîriyî ve hatîye nivîsîn. Herçend ev berhevok, ne ew metin be jî, tê famkirin ku pênc qirn in ku miletê me guh daye heman babetan. Mijar neguherîne, lê awayê ristîn û vegêranê guherîne û gihîştine heta roja me.

Ku êdî zivistan e û wexta berfê ye, Xwendê bike we nokên xwe qelandibin û bastîq jî we amade kiribe ji qelandinê. Ku we amade nekirîye fermo nivîsên me bixwînin û hazirîya xwe ya zivistanê bikin. Li quncikê mala xwe, nokên xwe bidin ber xwe û guh bidin dengê Eda Mahdoyê da ji we ra qala agirê nava dilê Edûleyê bike.

*Eşref Keydanî*

